

Du rêbernameyên nûh ji Ajansa Tenduristiya Gel

1. Hûn dikarin dîsa biçin mala mezinan.

2. Ger yek ji malbatê bi Korona werbigire divê hemî yên mezin li malê bimînin. Ev du rêbernameyên nûh ji Ajansa Tenduristiya Gel.

Divê hemî mezin li malê bimînin ger yek nexweş bê

Her kesê ku nîşanên sermê li ser heye divê were kontrolkirin ka ew Korona ye (covid-19). Ger nexweşiya kesek hebe, divê her kesê ku bi hev re dijîn kar nekin û li malê bimîne.

Bijîşkê yê berpirsiyarê testê (covid-19-test) bi kesên ku bi hev re dijîn re tîkiliyê datîne û ji wan re dibêje ka çî bikin ("rêgezên tevgerê"). Wê hingê Bijîşkê dê sertîfikayekê ji we re binivîse.

Kesên ku karê wan hebe û li malê bimînin dikarin tezmînata-meaşê bistînin. Sertîfikaya doktor hewce ye ku tezmînatê bistîne.

Heger hûn bi xwe-testkirin bikin û doktorek nebînin, bijîşkek heye ku ji her testê berpirsiyar e. Ew bijîşkê ku bang dike ye. Wê hingê hûn hemî rêzikan nas bikin.

Herêma wîlayeta Kalmar, ku berpîrsê lênihêrîna tenduristiya ye li wîlayetê, dixwaze ku hûn bi xwe testê li ser malpera 1177.se bixazin. Wê hingê divê nasnameya weya bankê hebe. (Ger nasnameya weya Bankê tune ye, li şûna wê li navenda tenduristiya xwe telêfon bikin).

Zarokên tendurust ên ku diçin pêşdibistan an dibistana seretayî – kûrsê ji 1-9 - divê li malê nemînin. Her kesê ku ne nexweş dikarin zarokan bibin û bînin û dûvre vegezin mal.

Nûçeyek baş - naha hûn dikarin biçin mala mezinan

Demek dijwar bo ji gelek kal û pîran re, dema ku nekarîn bi xizm û hevalên xwe re hevdiînê bikin. Lê ji 1-ê Çîre, hûn dikarin carek din biçin mala mezinan.

Ji ber ku hûn xeter li ser kal û pîran hene, divê her kes pir baldar bin. Divê hûn rêzikan taybetî bişopînin. Pêşî hûn bang li xaniyê dîkin û dipîrsin ka çî rêzik hene. Ew dikarin ji hev cûda li her malekê.

"Divê hemî mirov him ji hêla laş û him jî ji hêla derûnê de, baş bin," got Anders Tegnell, ku epidemiologîstek dewletê ye li Ajansa Tenduristiya Gel. "Ji ber vê yekê, divê mirov karibe careke din hevdu bibîne."

Ji ber belavbûna Korona Pandemic, lêkolîner û yên din di derbarê parastin û ewlekarî de gelek tişt fêr bûn. Ji ber vê yekê, Swêd dikare vê gavê bavêje. Lê girîng e ku her kes berpirsiyariyê bigire ser xwe û rêzikan bişopîne.



Agahdarî her du hefteyan

Tevkariya krîzê wîlayeta Kalmar, tevkarîyek di navbera hemû şaredarên wîlayetê ye, Navçeya wîlayeta Kalmar, Desteya Rêvebiriya wîlayeta Kalmar û hemî rayedarên din yên wîlayetê de hene. Dema krîzê di nav civakiyê de em bi hev re biryaran didin û bi hevûdu ra alîkariyê dîkin.



facebook.com/krissamverkan.kalmar

Kalmar kommun

